

**Gotina Encûmena Niştîmanî ya Kurd Li
Sûriya Bi Boneya Damezrandina Yekm
Partiya Kurd Li Sûriya- Heleb**

Mîvanên rêzdar

Xwîşk û birayên beşdar ...

Rêz û Silav

Weke hûn dizanin ,piştî serbestbûna welatê me Sûriyê li 17î Nîşanê 1946an , ji bin nîrê Firansa , bi çend salan , heyamek demoqretîk li Sûriyê peyde bû . Gelê me yê Kurd , di wê karnavê de sûde ji wê heyama heyî dît û hin komele û navendên rewşenbîriyê damezerandin . Lê mexebin wê heyamê nedomand , û li şûna demoqrasiyê , ramana şofînî , zor û bindestiyê li seranserî welêt cî girt . Em Kurd jî yek ji bêtirîn neteweyên , ku ew siyaset û pirojeyên şoven û awerte li ser hatine meşandin û îşkence û çewsanidin kişandine û ta neha jî ,ji ber dinalin . Wê lomê ji ber vê yekê li alîkî , belavbûna ramana rizgerkirina millet û welatan li cîhanê û bandora tevgera rizgarîxweza Kurdistanê û bi taybetî ya Kurdistana başûr ; Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd li Sûriyê , li 14î Huzêrana 1957an , biryara damezarandina yekemîn partî bi navê **EL PARTÎ** standin , ji bo bi destxistina mafên netewî yên rewa ji gelê me yê Kurd re .

Xoşwîstên delal

Mîvanên rêzdar

Weha **EL PARTÎ** xebata xwe berdewam kir , vê re , û bi taybetî piştî bidestxistina destlatê ji aliyê partiya EL BEIS li sala 1963an û di dûre hatina serok komar Hafêz Elesed li sala 1970ê ; herçû çewsandin , kuştin , giritin , îşkencekirin û zulim û zor li ser gelê Sûrî û bi taybet yê Kurd bû .û Sûriyê di pir firk û reweşgehan re derbas bû , ta gîha hevde ma buhara Erebi , û li 15/3/2011an şoreşa Sûriyê dest pêkir , û hêzên rikber li Sûriyê û tevgera me ya Kurd jî di nav de sergêjî ji dûzanê kir,

lê hêjaye em bi bîrwînin , ku gelê Kurd ji pêşî de deng bi xwe xist û tevlî şoreşê bû , herweha tevgera Kurd jî bi helwesta xwe ya rêzanî- bi navê koma partiyên Kurd – pêre bû , û dest bi dan û standinê bi rikberiya niştîmanî , çî hêz û çî kesên ser bixwe re kir ji bo serhevdina wê , zelalkirina pîrsa Kurdî li Sûriyê û çareserkirina pîrsa Sûriyê bi tevahî , lê mexebin ji ber pir sedemên hundir û derve , ew rastî, xemsarî û pîştêyaldanekê hat.

Li rex wê demezrandina lêvegergeha Kurdî , ji bo gelê me yê Kurd û serkeftina şoreşa Sûriyê pêwîst hate dîtin , û xebatek bê hempa ji ber ve hate kirin . Ta ku li 26/10/2011an kongera Kurdî ji aliyê hin partî , kesên serbixwe û hevrêzên xortan de hate li darxistin û encûmana Kurdî hate damezrandin.

Di encam de , gelek biryar hatin der , ji wan evên jêrînin :

1-pêwîste Sûriyê bibe dewletek demoqratîk, perlemanî ,Şariştanî û cûrecûr netew û ol .

Herweha rêzgirtina belgeyên navdewletî û perensîpên mafên mirovan bigre .

2-Hebûna gelê Kurd li Sûriyê , ziman û mafên wî yên rewa bi awakî fermî û destûrî , li gor peyamên navnetewî yên dewletên demoqrat û li ser bingeha nenavendiyê erê bibe .

3-Zor pêwîste Şoreşa Sûriyê aştiyane be , û rewşa ku Sûriyê guhayê sûcê rêjîmê û ew di ber de berpirsyar e .

4-Hate tekûzkirin li ser serxwebûna biryarên hêzên niştîmanî di çareseriyaya pîrsa Sûriyê de .

5-Li ser xweşkirin û pihêtkirina têklyên encûmena Kurdî bi hêzin Kurd ên derveyî wê re , ji bo yekirina pirojeya Kurdî ji her alî ve , hat tekûzkirin .

Xwîşkino , birano **D.R. (7)**